

## Kurdisch

Dê û bavên hêja,

Hûn bixêr hatin Duisburgê. Divê hemû zarok yê temenê wan di navbera 6 û 18 salî de biçin dibistanê.

Tiştên divê hûn bikin ev in:

- 1- Divê hûn li Duisburgê li ba Dayireya Hemwelatiyan yan li ba Dayireya Biyaniyan xwe qeyd bikin.
- 2- Dema we xwe qeyd kir, gere hûn hevpeyvîneke bi Navenda Engtegrasiyona Civakî re bikin. Ji bo vê hevpeyvînê wê ji we re randevû were şandin.
- 3- Dema hûn hatin vê randevûyê pasapora xwe bi xwe re bînin. Eger karneyên dibistanan yê zarokên we hebin wan jî bi xwe re bînin.
- 4- Navenda Entegirasiyone Civakî ji Dayira Perwedê re ewraqê zarokên we dişîne.
- 5- Paşê Dayireya Tenduristiyê wê ji wer e randevûyeke biçîne. Ev gelek giring e. Divê her zarok beriya dest bi dibistanê bike, were muayane kirin.
- 6- Piştî muayeneya doktor Dayireya Perwerdê ji we re nameyek dişîne. Di vê nameyê de navnişana dibistana ku hûn zarokên xwe biçinê heye.
- 7- Dema we ev name girt, zarokên xwe li dibistana hatiye destnişankirin qeyd bikin.
- 8- Ji kerema xwe, dema hûn di nava Duisburgê yan li derveyê Duisburgê mala xwe biguherin me agahdar bikin.